



KODGUHERÎN DI PEYWENDA DUZIMANÎYÊ DA: MÎNAKA KURMANCÎYA ÎDIRÊ

Yusuf TAŞTAN & Tahirhan AYDIN

Code-Switching in the Context of Bilingualism: The Example of Kurmanji in Iğdır

İkidillilik Bağlamında Kod Değişimi: Iğdır Kurmancisi Örneği

Yusuf TAŞTAN

ORCID 0009-0001-9752-4585 | tastannyusuf.83@gmail.com
PhD Student, Department of Kurdish Language and Culture, Dicle University, Türkiye.

Tahirhan AYDIN

ORCID: 0000-0002-2586-2956 | tahirhan.aydin@dicle.edu.tr
taydin@beu.edu.tr
Prof. Dr., Department of Eastern Languages and Literatures, Sezai Karakoç Faculty of Letters, Dicle University, Diyarbakır.
Faculty of Theology, Bitlis Eren University, Bitlis. Türkiye.

Citation/Jêgir/Atrf:

Taştan, Y. & Aydın, T. (2025). Kodguherîn di peywenda duzimanîyê da: mînaka kurmancîya îdirê. *Kurdiyat* (12), 83-99. DOI: 10.55118/kurdiyat.1819884

Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü:

Research Article/Gotara Vekolînê/Araştırma Makalesi
Received/Dema Hatîne/Geliş Tarihi: 08.11.2025
Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 28.12.2025
Publication Date/Dema Weşandinê/Yayın Tarihi: 30.12.2025

Peer-Review/Hekemî/Hakemlik:

Double anonymized-Two External/ Cot Nenas-Du ji derve/
Çift Taraflı Kör Hakemlik-İki hakem

Plagiarism Checks/Kontrola İntihalê/Benzerlik Kontrolü:

This article has been scanned by iThenticate plagiarism website./
Ev gotar di malpera întihalê ya iThenticate ra hatiye derbaskirin./
Bu makale iThenticate adlı intihal sitesinde taranmıştır.

Ethical Statement/Beyana Etik/Etik Beyanı:

It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited./ Hatîye beyankirin ku di pêkanîn û nivîsîna vê xebatê de hemû rêzikên zanîstî û etik hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî tîkûz hatine referanskirin./ Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.

Conflicts of Interest/Nakokiyên Berjewendiyên/Çıkar Çatışması:

There is no conflict of interest between the authors and any parties in the article./ Di gotarê de li navbera nivîskarên û ti aliyên din nakokîya berjewendiyê tune ye./ Yazarlar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.

Grant Support/Alîkarîya Darayî/Maddî Destek:

The authors acknowledge that they received no external funding in support of this research./ Nivîskar beyan dikin ku wan ji bo vê vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine./ Yazarlar, bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.

Copyright & License/Mafê Telifê & Destûr/Telif Hakkı & Lisanslama:

Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0./ Nivîskar li jer lîsansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin./ Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

Kurte

Di erdnîgarîyên pirneteweyî da, têkiliyên mirovî dibin sedem ku komên etnîkî yên cihêreng di warê zimên da bandorê li hev bikin. Li Îdirê, hem ji ber ku kurd û tirk di nav hev da dijîn hem jî ji ber fermîbûna zimanê tirkî û polîtîkayên zimên ên fermî; bandora zimanê tirkî zêdetir li ser axaftina kurdî ya kurdên Îdirê çêbûye. Ev rewş bûye sedem ku kurdên Îdirê gelek kodên kurdî biguherînin û kodên tirkî veguhêzin nav axaftina xwe ya kurdî, ku ev jî di zimannasîyê da wekî kodguherîn (code-switching) tê nasîn. Armanca vê xebatê ew e ku axaftina kurdî ya kurdên Îdirê, di çarçoveya kodguherînê da binirxîne ka kodguherîn di kurdiya kurdên Îdirê da di kîjan astê da û di kîjan kontekstan da pêk tê. Xebat, pêşî çarçoveya teorîk a kodguherînê li ser bingeha pênaseyên lêkolînerên wekî Poplack, Crystal, Muysken, Wardhaugh û Scotton pêşkêş dike. Pişt ra balê dikişîne ser cureyên kodguherînê û pêwendîya navbera kodguherîn û deynkirinê (borrowing) nîqaş dike. Di beşa analizê da mînakên têkildarî mijarê yên di axaftina kurdiya Îdirê da, tene pêşkêşkirin. Ev mînak, di warê kodguherîna navberristeyî (inter-sentential) û kodguherîna navristeyî (intra-sentential) da tene vekolin. Daneyên xebatê nîşan didin ku di axaftina kurdî ya kurdên Îdirê da hem di asta navberristeyî da hem jî di asta navristeyî da gelek kodên tirkî tene dîtin û ev kod bi awayên cuda cuda di nav axaftinê da cî digirin. Ji ber ku di nav xebatên derheqê kurmançî da, xebatên li ser kodguherînê ne zêde ne; ev xebat dê ji bo lêkolînên nû yên di vî warî da bibe çavkanîyekê.

Peyvên sereke: Kontakta zimanan, duzimanî, kodguherîn, deynkirin, kurdiya kurmançî, Îdir.

Abstract

In multiethnic societies, human relationships lead different ethnic groups to influence each other linguistically. In the context of Iğdır, the coexistence of Turkish and Kurdish communities, coupled with the official status of Turkish, has intensified the influence of Turkish on the Kurdish dialect spoken by the local population. This situation has led Iğdır Kurds to alter various Kurdish linguistic codes and incorporate Turkish codes into their speech—a phenomenon known as code-switching. The aim of this study is to evaluate the speech of Iğdır Kurds within the framework of code-switching and to identify the levels (intra-sentential and inter-sentential) and contexts in which this occurs. The study first establishes a theoretical framework based on the definitions of scholars such as Poplack, Crystal, Muysken, Wardhaugh, and Scotton. It then examines the types of code-switching and discusses its relationship with linguistic borrowing. In the analysis section, examples from Iğdır Kurdish (Kurmanji) are presented and analyzed in terms of inter-sentential and intra-sentential switching. The findings indicate that Turkish codes are prevalent in the Kurdish speech of Iğdır Kurds at both levels. Given the scarcity of research on code-switching in Kurmanji, this study aims to serve as a significant reference for future research in the field.

Keywords: Language contact, bilingualism, code-switching, borrowing, Kurmanji Kurdish, Iğdır.

Özet

Farklı etnik grupları barındıran coğrafyalarda kurulan insani ilişkiler, bu grupların dilsel açıdan birbirlerini etkilemesine yol açar. Iğdır'da hem Kürtlerin ve Türklerin bir arada yaşaması hem de Türkçenin resmi dil statüsü, bölgedeki Kürtler tarafından konuşulan Kürtçe üzerinde Türkçenin etkisini artırmıştır. Bu durum, Iğdır Kürtlerinin birçok Kürtçe kodu değiştirmesine ve konuşmalarına Türkçe kodlar aktarmasına neden olmuştur; bu olgu dilbilimde "kod değiştirme" (code-switching) olarak adlandırılır. Bu çalışmanın amacı, Iğdır Kürtlerinin konuşmalarını kod değiştirme bağlamında değerlendirmek; kod değiştirmenin gerçekleştiği düzeyleri (cümle içi ve cümleler arası) ve bağlamları ortaya koymaktır. Çalışmada öncelikle Poplack, Crystal, Muysken, Wardhaugh ve Scotton gibi araştırmacıların tanımlarına dayanarak kod değiştirmenin teorik çerçevesi sunulmuştur. Ardından kod değiştirme türlerine odaklanılmış ve kod değiştirme ile ödünçleme (borrowing) arasındaki ilişki tartışılmıştır. Analiz bölümünde, Iğdır Kürtçesi (Kurmançî) konuşmalarından konuyla ilgili örnekler yer verilmiştir. Bu örnekler cümle içi ve cümleler arası kod değiştirme açısından incelenmiştir. Araştırma verileri, Iğdır Kürtlerinin konuşmalarında hem cümle içi hem de cümleler arası düzeyde birçok Türkçe kodun yer aldığını göstermektedir. Kurmançî Kürtçesinde kod değiştirme üzerine yapılan çalışmaların sınırlı olması nedeniyle bu çalışma, alandaki yeni araştırmalar için bir referans teşkil edecektir.

Anahtar Kelimeler: Dil teması, ikidillilik, kod değiştirme, ödünçleme, Kurmançî Kürtçesi, Iğdır.

Destpêk

Li ser rûyê dinyayê ji mêj ve her tim temasa civakan çê bûye û însanan bi saya vê temasê bi hev ra têkilî danîne. Ev têkilî bi piranî bi rêya koç, bazirganî, şer, perwerde, medya, zewac, polîtîkayên dewletan û gelek rêyên din çê bûne (Crystal, 2001; Auer, 2021, r. 147). Herweha vê yeke, bi awayekî xwezayî têkilîyek di navbera zimanan da jî çê kirîye. Di encama têkilîya zimanan da, zimanan gelek bêje ji hev girtine ango deyn kirine û gelek ji van bêjeyên hatine girtin êdî bûne perçeyekî leksîkona zimanê bingehîn. Her ku têkilî zêde bûne danûstandinên wan jî zêde bûne û hewcedarî bi hev famkirinê çê bûye. Ji bo ku hev fam bikin carinan zimanekî wekî zimanê hevpar (lingua franca) bi kar anîne û bi rêya wî zimanî têkilîyên xwe domandine (Holmes, 2013, r. 82). Herweha di gelek civakan da jî insan hînî zimanê hev bûne û bi hînbûna zimanan, kesên duziman û pîrziman peyda bûne.

Li ser rûyê dinyayê bi milyonan insan di jîyana xwe ya rojane da ji yekê zêdetir zimanan dipeyîvin û di axiftina xwe da di navbera zimanan da diçin û tên. Di vê kontekstê da fenomena kodguherînê (code switching) derdikeve holê. Kodguherînê tê wateyê ku didu yan jî zêdetir hêmanên zimanên cuda di nav axiftinekê da ji hêla heman kesî ve tên bikaranîn (Poplack, 1980); (Treffers-Daller, 2025; Myers-Scotton, 1993). Xebatên ku li ser kodguherînê hatine kirin; nîşan didin ku kodguherîn, tenê ne fenomeneka zimanî ye di heman demê da fonksiyonên sosyokulturî, pragmatîk û nasnameyî jî dihewîne (Myers-Scotton, 1993). Gelek vekoler (Poplack, 1988; Scotton, 1993; Milroy & Muysken, 1995; Crystal, 2003; Wardhaugh, 2010) li ser vê yekê disekinin ku kodguherîn di nav stratejîyên ragihandinê da bi zanebûn an jî bê zanebûn pêk tê û di têkilîyên civakî da rol digire. Bi taybetî di civakên pîrzimanî da, ziman tenê ne ji bo hêsankirina ragihandinê ye di heman demê da ji bo îfadekirina nasnameya sosyokulturî, xurtkirina aîdiyeta civakê û têkilîyên prestîjbilind e jî.

Li Tirkîyeyê kurd, ji ber polîtîkayên fermî yên zimên û rewşa civakî ya kurdan bi piranî bi du zimanan dizanin û duzimanî di nav kurdan da berbelav e (Subaşî, 2020, r. 62). Li bajarê Îdirê jî kurd ji ber du awayan bi duziman in; ji ber polîtîkayên fermî bi mecbûrî bi duziman in, ji ber ku ew û tirk bi hev ra dijîn, bi awayekî xwezayî bi duziman in. Helbet duzimanîbûna kurdên Îdirê herî zêde ji ber polîtîkayên fermî yên zimên e. Gelekî berî avabûna Komara Tirkîyeyê jî li Îdirê kurd û tirk bi hev ra dijîyan û ji kurdan hin kes bi duzimanî bûn lê li herêmê duzimanîya kurdan herî zêde bi zêdebûna dibistanan û bi pêşketina çapemeniyê derket holê. Herçiqaş di vî warî da daneyên çendani (quantitative) tunebin jî bi çavdêriyê jî mirov dikare xwe bigihîne vê encamê. Bêguman zimanê duyem yê kurdên Îdirê tirkîyeka têkilhev e ku ji tirkîya standard û tirkîya Azerbaycanî pêk tê. Axiftina kurmançî ya kurdên Îdirê hem di sînorê rîsteyê da hem jî di sînorê bêje û firazê da gelek kodên ji vê Tirkîyê di hundirîne. Armanca vê xebatê jî ew e ku axiftina kurdî ya kurdên Îdirê di konteksta kodguherînê da binirxîne ka kodguherîn di kurdîya kurdên Îdirê da di çî astê da (di asta navristeyî û asta navberristeyî da) û di kîjan kontekstan da pêk tê. Ji ber ku xebatên li ser kodguherînê di nav lîteratûra kurdîya kurmançî da ne zêde ne, ev xebat dê ji bo xebatên nû bibe yek ji referansên qadê.

Di çarçoveya duzimanî û pîrzimanîya di nav kurdan (kurmançan) da hin xebat hatine kirin lê li ser fenomena kodguherînê xebat kêr in. Ji ber vê yekê, ji bo binavkirina kurdî ya têgihên tîkildar û hayjêbûna lîteratûra kurdî xebatên hatine kirin giring in. Xebatên heyî zêdetir li ser kontakta kurdî û zimanên bîyanî, bi taybetî zimanê tirkî ye. Varol (2014) li ser hevkarîgerîya tirkî û kurmançî xebitîye û di xebata xwe da li ser xuyangên rêzimanî yên duzimanîyên kurd sekinîye. Li gor asta bondora zimanê tirkî ya li ser axiftina kurdî, duzimanîyên Wanê senifandîye. Varol (2021) di xebateka xwe ya din da jî li ser sînorên guherîna kodên kurmançî sekinîye û li gor miqdarê, cureyên bêjeyên transferî nava kurdî bûne dane ber hev. Haig (2007) di xebateka xwe da behsa deynkirina ji tirkî ji bo kurmançî dike û zêdetir behsa bandora tirkî ya li ser kurmançî dike. Dîsa Haig (2007) di çarçoveya bandora tirkî ya li ser kurmançî da kodên tirkî yên nav kurmançîya Dêrsimê nirxandîye. Yonat (2023) di xebateka xwe da li ser tirkîya kurdên duziman sekinîye û midaxleyên fonolojîk ên kurdî yên li ser tirkî vekolaye. Ertekin û Açar (2019) tesîra tirkî ya li ser kurmançîya Wanê vekolane û tîkildarê vê xebatê behsa têgihên kodguherîn û deynkirinê jî kirine û têgiha deynkirinê wekî “jêgirtin” bi nav kirine. Subaşî (2020) di çarçoveya tesîra tirkî ya li ser kurmançî li ser deynkirinê sekinîye û têgiha deynkirinê wekî “qerzîkirin” bi nav kirîye û kodguherînê jî wekî “kodguhertin” bi nav kirîye. Delikaya (2016, r. 55) di teza xwe ya lîsansa bilind da dema behsa peyvsazîya kurdî (kurmançî) kirîye; wekî rêyeka peyvsazîyê, behsa deynkirinê jî kirîye û mînak ji bo bêjeyên ji neh zimanan hatine deynkirin dane. Ballı (2019) li ser têkilîya kurdî û tirkî sekinîye û di vê çarçoveyê da behsa bêjeyên ji tirkî hatine deynkirin kirîye. Van xebatên navborî bi piranî kontakta kurdî û tirkî nîqaş kirine û hinekan

jê têgihên mijarê ra têkildar bi kurdî bi nav kirine. Rasterast xebatên ku li ser kodguherînê hatine kirin, pir kêr bin jî hene. Zebârî (2014) di xebata xwe da behsa kodguherîna nav axiftina kurdên Duhokê dike ku li vir kodên Erebi derbasî nav axiftina kurdî dibin. Vekoler îdîa dike ku ev xebata ewil e ku kodên Erebi yê nav axiftina kurdî vekolaye. Herkenrath (2016; 2020) di du heb daxuyanîyên xwe yê zanistî da li ser kodguherîna kesên kurmançî, tirkî û almanîaxiv xebitîye ku ev xebat ji hêla kodguherîna sêzimanaxivan ve giring in. Di literatûra kurdîya kurmançî da di derheqê kodguherînê da ji bilî van her sê xebatan em rastî xebateka din nehatin. Ev yek jî dide xuyakirin ku qada xebatên li ser kodên bîyanî yê nav kurmançî qadêka xam e û hewcedariya wê bi xebatê heye. Îdir jî ji xwe ji hêla xebatên zimên ve qadêka zêdetir xam e.

Metodolojî

Wekî ku li jorê jî hat destnîşankirin qada xebatê, bajarê Îdirê ye. Bi tevahî beşdarên xebatê 10 kes in. Beşdar hinek jê nas bûn, hinek jî bi rêya nasan hatin tesbîtîkirin û pê ra hevpeyvîn hatin kirin. Agahîyên di derheqê beşdaran da, di Tablo 1'ê da hatine nîşandan. Di Tablo 1'ê da agahîyên wekî temen, zayend, agahîyên perwerdeyê (DS: Dibistana Seretayî, ND: Neçûye Dibistanê, L: Lîsans), pîşe, cihê jidayîkbûnê (CJ), cihê ku beşdar niha lê dijîn (CD) û salên beşdaran ên li bajêr derbas bûne (SB) hatine nîşandan. Ji beşdaran 5 kes jin, 5 jî mêr in. Hemû jin bermalî ne, ji mêran jî yek bazirgan e, 2 kes ajokar in, yek karker e, yek jî bê kar e. Neh kes li gund, yek jî li bajêr ji dayîk bûne û ji van 7 kes niha li bajêr dijîn, yek kes tenê li gund dijî û 2 kes jî carinan li gund carinan jî li bajêr jîyana xwe didomînin. Ji beşdaran 7 kes qet neçûne dibistanê, 2 kesan dibistana seretayî qedandîye, kesekî jî lîsans qedandîye.

Beşdar	Temen	Zayend	Perwerde	Pîşe	CJ	CD	SB
ŞN	76	Mêr	DS	Bazirganî	Gund	Bajar	35
FA	107	Jin	ND	Bermalî	Bajar	Gund	20
SŞ	72	Mêr	ND	Ajokar	Gund	Gund + Bajar	30
YT	57	Mêr	DS	Ajokar	Gund	Bajar	40
SN	60	Jin	ND	Bermalî	Gund	Bajar	28
MS	78	Mêr	ND	Bê kar	Gund	Bajar	33
FT	85	Jin	ND	Bermalî	Gund	Bajar	32
NT	40	Mêr	L	Karker	Gund	Bajar+gund	30
MA	50	Jin	ND	Bermalî	Gund	Bajar	30
SO	75	Jin	ND	Bermalî	Gund	Bajar	40

Tablo 1: Agahîyên Beşdaran

Xebatên kualîtatif, dorhêlên civakî û kesên di van dorhêlan da dijîn vedikolin û bi vî awayî li bersivên pirsan digerin (Berg, 2001, r. 6). Di vê çarçoveyê da daneyên vê xebatê bi rêya hevpeyvînên rû bi rû ku bi rêya hevpeyvînê dane berhevkin jî rêbazeka bidestxistina daneyên xebatên kualîtatif e (Berg, 2001, r. 7), û bi qeydkirina dengê axiveran hatin bi dest xistin. Hevpeyvîn bi teknîka hevpeyvîna nestandardkirî (unstandardized interview) hatin kirin ku di vê teknîkê da pirs bi pêş da nayên amadekirin û hevpeyvîn bi awayekî spontane di atmosfera sohbetê da pêk tê (Berg, 2001, r. 69,70). Heta ku ji destê me hat me hevpeyvînê xwe di atmosfera sohbetê da kir. Ji ber endîşeyên însanan ên di derheqê qeydkirina dangan da, peydakirina axiveran zehmet bû û vê yekê hejmara beşdarên xebata me sînordar kirin. Ji bo çareserkirina endîşeyên etîkê jî rapora lijneya etîkê hat girtin.

Wekî ku berê jî hatibû behskirin; ji ber rola perwerdeyê ya li ser kurdîya kurdên Îdirê, asta perwerdeyê ya beşdaran hat diyarkirin. Herweha, ji ber ku dorhêla civakî bandorê li ser temasa zimên dike; dorhêla li gund û ya li bajêr, du dorhêlên cuda yê temasa ziman in (Sodah, 2019, r. 960). Ji ber vê yekê, cihê jidayîkbûnê û cihê jîyanê yê beşdaran hat diyarkirin. Girêdayî vê, salên beşdaran ên li bajêr derbasbûyî jî hat diyarkirin. Agahîyeka din a di derheqê beşdaran da jî temen e. Wisa tê hizirkirin ku li gor nîşan, temasa zimên diguhere (Subaşi, 2020, r. 63) û kesên temenzêde, kêmtir di bin bandora tirkî da dimînin. Ji ber vê temenê beşdaran hat diyarkirin. Ji ber ku statuya civakî jî hêmaneka diyarker a temasa zimên e pîşeyên beşdaran jî hat diyarkirin. Bi taybetî di nav civaka kurdan da jin li gor mêran kêmtir di temasa

zimên da ne û hîn heta van salên dawî jî ji hêla rêjeya asta xwendinê ve jin di binîya mêran ra bûn (Subaşı, 2020, r. 63). Ji ber vê beşdar ji hêla zayendê ve ji hatin diyarkirin.

Mînakên kodguherînê, ji axiftinên ku li Îdirê bi rêya hevpeyvînên rû bi rû hatibûn qeydkirin hatin girtin. Ewîl, ev qeyd hatin deşîfrekirin û pişt ra her axiver bi tîpan hatin kodkirin û mînakên kodguherînê ji metnên deşîfrekirî hatin girtin. Ji ber ku gelek dengên di axiftina tirkî ya kurdên Îdirê da li fonetîka kurdî tîn, di deşîfrasyona gotinên tirkî da jî alfabe ya kurdî hate bikaranîn lê hin dengên tirkî yên wekî [œ], [y], ku di alfabe ya tirkî da bi tîpên /ö/, /ü/ tîn sembolîzekirin (Sebzecioğlu, 2017, r. 71), li gor alfabe ya tirkî hatin deşîfrekirin. Bi tevahî bi deh kesan ra hevpeyvîn hat kirin lê mînakên kodguherînê di axiftinên çar kesan da hatin dîtîn. Ji ber vê yekê mînakên kodguherînê ji çar hevpeyvînan hatine dayîn.

Wekî ku li jorê jî hate gotin ev xebat xebateka kualîtatif e û xebatên kualîtatif, di dorhêleka xwezayî da pêk tîn ku vekoler di vê dorhêlê da di asteka bilind da tevî ezmûnên rastî dibe û bi vî awayî asta kîtekîtan bi pêş dixê (Creswel, 2003). Ji ber vê daneyên xebatê jî bi awayê kualîtatif hatin analîzkirin.

Mînakên kodguherînê di çarçoveya nîqaşên beşa teorîk da li gor nêrînên Carol Myers-Scotton hatin analîzkirin. Analîz di çarçoveya van pirsan da hatin kirin:

1. Di axiftina kurdî ya kurdên Îdirê da kodguherîn di kîjan astê da (navberristeyî yan navristeyî) pêk tî?

2. Di axiftina kurdî ya kurdên Îdirê da kodguherîna navberristeyî (inter-sentential) û kodguherîna navristeyî (intra-sentential) çawa pêk tî?

3. Di kurdîya Îdirê da kodguherîn di kîjan kontekstê da pêk tî?

1. Çarçoveya Teorîk

1.1. Kontakta Zimên

Bi awayê herî hêsan dikare bê gotin ku kontakta zimên, axiftina du an jî zêdetir zimanan e ku di heman demê da û di heman nêvengê da pêk tî. Ji bo kontakta zimên duzimanî an jî pîrzimanîyeka herikbar navê, lê divê di navbera kesên ku zimanê cuda diaxivin da kêmekî ragihandin hebe (Thomason, 2001, r. 1). Kontakta zimên bi piranî wekî encama têkilîya kesên zimanên cuda diaxivin, derdikeve holê. Cureyê temasa zimên û rêjeya temasê, ji hela faktorên civakî yên çandî, siyasî yan jî hêza aborî ve û ji hela îdeolojîyên zimên ve tîn diyarkirin. Di gel vê, parametreyên rêzimanî li ser çendanî û çawanîya temasa zimên bandorê dikin (Auer, 2021, r. 147).

Dema mirov berê xwe dide sedemên kontakta zimanan; Crystal (2001) jî bo vê yekê diyar dike ku koçberî, cîranî, perwerde, berbelavbûna zimanekî wekî lingua franca, medya, înternet û polîtîkayên zimên ên dewletan jî bo kontakta zimên sedemên sereke ne. Thomason (2001, r. 22) jî bo sedemên kontakta zimên çend xalan diyar dike ku ji van dagirkerî û koç, koça jî bo dîtina kar, têkilîyên candî û zewac, perwerde û bazirganîyê jî bo kontakta zimanan wekî sedem nîşan dide û jî bo sedemên ku lezê didin kontakta zimanan jî dibêje berbelavbûna sanayîyê û bajarîbûnê kontakta zimanan berbelavtir kirîye. Crystal (2001, r. 18,19) li ser bandora înternetê ya li ser kontakta zimanan disekine û îdîa dike ku înternetê rêyeke hevpar a zimanî (netspeak) ava kirîye û vê rêyê bi awayekî ecêb leza danûstanên navbera zimanan zede kirîye (Crystal, 2001, r. 18,19).

Thomason (2001, r. 8) li ser mekanê kontakta zimanan disekine û diyar dike ku kontakta zimên li her derê dinyayê çê dibe û li ser rûyê dinyayê zimanekî bi temamî îzolebûyî tune ye. Di vê çarçoveyê da cih û civaka ku kontakta zimanî lê çê dibe, ji aliyê bikaranîna zimên a wê civakê ve hin encamên xwemal jî derdixê holê (Subaşı, 2020, r. 64).

Kontakta zimanan, li ser morfolojî, fonolojî û sentaksa zimên bandor dike (Thomason & Kaufman, 1988, r. 65-100). Di encama kontakta zimanan da fenomenên wekî deynkirin (Thomason & Kaufman, 1988, r. 37), veguhastina zimên (language shift) (Winford, 2003, r. 16), pîdgîn, kreol (Wardhaugh & Fuller, 2015, r. 116), şîbîna zimanan (language convergence) (Matros, 2009, r. 238) û kodguherîn (Appel & Muysken, 2005, r. 117) derdikevin holê.

1.2. Kodguherîn

Kodguherîn transfera hêmanên zimên e ku hêman ji zimanekî transferî nav zimanekî din dibin. Ango axiver di esnaya axiftinê da di dîskorsekê da kodên du an jî zêdetir zimanan li nava hev dixê (Poplack, 1988, r. 1174). Ev kod carinan di asta bêje û firazê da carinan jî di asta risteyê da transfer dibin (Poplack, 2001, r. 2062). Crystal (2003, r. 164) jî bo kodguherînê dibêje kodguherîn ew prose ye ku axiver bi awayekî simûltane ji zimanekî derbasî zimanekî din dibin. Ev transfer bi piranî di navbera kesên duzimanî an jî pirzimanîyan da pêk tê. Milroy & Muysken (1995, r. 7) jî dibêjin kodguherîn ew tişt e ku kesekî duzimanî di heman axiftina xwe da du yan jî zêdetir zimanan wekî alternatîf bi kar tîne. Ligor Wardhaugh (2010, r. 84) jî, kodguherîn, pêvajoya hîlbijartina kodên zimên e ku dema însan diaxivin pêk tê.

Kodguherîn bi piranî di navbera kontrasta zimanê bingehîn (main/matrix language) û zimanê bicihkirî (embedded language) da tê nixandî. Zimanê ku axiftin pêk tê kirin zimanê bingehîn e, zimanê ku kêmtir di axiftinê da rol digire zimanê bicihkirî ye (Scotton, 1993, r. 3).

Di axiftinê da pêkhatina kodguherînê ji ber sedemên cuda cuda çê dibe. Hevkarî, bêhmkanî, kêmasîya têrkirina zimên, giringîya wateyê, xîtabkirina girseyên cuda, balkişandina ser xaleka giring, rewşa derûnî ya axiver, sedemên pragmatîk, daxwaza balkişinê ya axiver hinek ji van sedeman in (Malik, 1994, r. 16-18). Kim (2006, r. 47-50) jîbo sedemên kodguherînê dibêje dema axiver di derheqê mijarekê da diaxive heke ji aliyê zimên ve hakimîyeta wî ya zimên tune be, heke di zimanê bingehîn da kêmasîya têgihê hebe an jî miqabilî têgihê di zimanê bingehîn da bêjeyekê nebîne, axiver westîyayî û bi hêrs be, axiver hewl bide ku ji bo ku axiftina xwe rehetir bide famkirin hêsan bike, axiver ji axiftina kesekî din gotinan transfer bike serî li kodguherînê dide. Gumprez (1982, r. 78) diyar dike ku axiver, bi piranî ji bo neqilkirinê, ji bo ku bandora peyama xwe zêdetir bike yan jî zêdetir balê bikişîne ser peyama xwe kodên zimanekî din dixê nav axiftina xwe. Holmes (2013, r. 42) dibêje axiver ji bo ku qabîliyeta xwe ya retorîkê nîşan bide kodan diguhere.

Herçend senifandinên cuda yê kodguherînê hebin jî, bi giştî behsa du cureyên sereke tê kirin (Yılmaz, 2014, r. 210). Yek kodguherîna navbera risteyên cuda ye ango risteyek bi temamî bi zimanekî ye risteya din bi zimanekî din e ku ji vî cureyî ra kodguherîna navberisteyî (inter-sentential code-switching) tê gotin, ya din jî ew kodguherîn e ku di nava risteyê da pêk tê, jê ra kodguherîna navristeyî (intrasentential code-switching) tê gotin (Scotton, 1993, r. 3-4).

1.2.1. Kodguherîna Navberisteyî

Transfera navberisteyî, cureyekî kodguherînê ye ku di navbera du risteyên temam da pêk tê. Risteya ewil bi temamî aîdî zimanê bingehîn e, risteya dû wê bi temamî aîdî zimanê bicihkirî ye. Li gor Poplack (2001, r. 2062) ev yek transfera kodan e ku di navbera risteyan da yan jî di nav sînorên axiftinê da pêk tê. Muysken (2012, r. 301,302) dibêje transfera navberisteyî, di navbera du risteyên serbixwe an jî di navbera du risteyên hevta, yê aîdî heman derbirê ku dikarin cihê hev bigirin da pêk tê. Myers- Scotton dema behsa motîvasyonên kodguherînê dike, ji bo motîvasyonên vî cureyê kodguherînê van çend sedeman tîne zimên (Myers-Scotton, 1993, r. 114-142) ku di vê xebatê da mînakên kodguherîna navberisteyî dê di vê çarçoveyê da bînin nixandî:

- Axiver ji bo balê bikişîne ser otorîteya xwe yan jî ji bo ku mesafeyekê bike navbera xwe û mixatebê xwe kod diguhere. Yan jî ji bo ku mesafeya navbera xwe û mixatebê rake û nêzikatîyê nîşan bide mixatebê xwe, derbasî zimanê mixatebê dibe ango kod diguhere.
- Axiver naxwaze di nav nasnameya zimanekî da bifetise, dixwaze ji prestîja her du zimanan sûd wergire. Ji ber vê, kodguherînê wekî terzekê ji xwe ra bi kar tîne.
- Dema ku mixatebekî nû tevî axiftinê dibe yan jî mijara axiftinê diguhere, berê axiftinê ji mijareka şexsî ber bi mijareka fermî ve diguhêze axiver kodên axiftinê ango zimanê axiftinê diguhere û derbasî kodeka guncavtir dibe.
- Axiver ji bo ku giringîya peyamê zêdetir diyar bike zimên diguhere.
- Axiver dema ji kesekî gotinekî neqil dike; ji ber helwesta parastina nasnameya wî; neqlê, bi zimanê wî kesî dike.

- Axiver ji bo ku peyamê baştir bide famkirin an jî bide pesendkirin û ji bo rê li pêşiya şaşfamkirinê bigire peyamê bi her du zimanan tîne zimên.

1.2.2. Kodguherîna Navristeyî

Kodguherîna navristeyî, cureyekî kodguherînê ye ku kodên nava risteyê transfer dibin. Di nava risteyê da peyv an jî frazeka aîdî zimanê yekem dikeve nava risteya axiver a zimanê duyem. Ango di nava sînorên risteyekê, firazekê an jî bêjeyekê da linavhevixistina du yan zêdetir zimanan e (Poplack, 2004). Di xebateka di vî warî da, hatîye nîşandan ku hêmanên zimanasîyê yên wekî navdêr, lêker û nîşandêrên vegotinê di kodguherînê da hatine tesbîtkirin (Rasdi, 2016).

1.2.3. Kodguherîn û Deynkirin

Kodguherîn û deynkirin (borrowing) du fenomenên cuda ne ku di peywenda duzimanîyê da derdikevin holê. Di hin xebatên kurdî da ev têgih wekî wergirtin û jêgirtinê jî tê binavkirin. Deynkirin ew e ku ji zimanê bicihbûyî bêjeyek ji bo zimanê bingehîn tê transferkirin û li leksîkona wî zimanî tê zêdekirin (Bucholtz & Zimman, 2019, r. 268). Poplack (2018, r. 5) di xebateka xwe da dibêje deynkirin ew pêvajoye ku hêmanên bêjeyî yên ji zimanekî tîne û di nav vegotina zimanekî din da bi cih dibin û tevî vegotina wî zimanî dibin. Di heman xebatê da Poplack (2018, r. 6) dibêje girtina bêjeyeka bi serê xwe deynkirin e lê komên peyv an jî pir bêjeyî kodguherîn e. Digel vê jî bo deynkirinê divê rêjeya bikaranîna hêmana bêjeyî ya di nav civakê da pir be û divê jî hêla morfo-sentaktîk ve entegreyî zimanê bingehîn bibe.

Treffers-Daller (2025, r. 348,349) jî ji bo deynkirinê rewşa entegrebûnê tîne zimên û rewşê bi mînakê şîrove dike û dibêje bêjeya *job/pîşe* a îngilîzî, di nav axiftîna almanî da hatîye bikaranîn û qertafa kesê sêyem ê pirjimar *-en* a almanî girtiye û ji bo ku li rastnivîsa almanî bê dengê /b/'yê lê hatîye zêdekirin. Ango bêjeya îngilîzî *job* dema di nav axiftîneka almanî da hatîye bikaranîn ji bo almanî hatîye entegrekirin û wekî bo bêjeyeka almanî be wekî *jobben* hatîye bikaranîn.

Treffers-Daller (2025, r. 349,350) di mijara bikaranîna nav civakê da Poplack rexne dike û dibêje ku bêje, dibe ku li her hêla civakê bi heman mejerê neyê bikaranîn. Di mijara entegrasyona bêjeyê ya jibo zimanê bingehîn da jî hebûna îstîsnayan tîne zimên. Hin caran hin bêjeyên ku di nav deyngirtinê da tîne nîrxandin û nehatine entegrekirin jî hene. Li gor Myers-Scotton (1993) di deynkirinê da dibe ku bêjeya zimanê bicihkirî bi gelemperî entegreyî fonetîka zimanê bingehîn bibe lê ev yek ne mecbûr e hertim wisa pêk bê. Jiber vê yekê jî entegrebûnê wekî pîvaneka deynkirinê nabîne.

Li gor Milroy & Muysken (1995, r. 189) kodguherîn di risteyekê da yan jî îfadeyekê da bikaranîna du zimanan e, deynkirin jî ew tişt e ku hêmanên bêjeyê yên ku ji zimanekî din hatine girtin, tevî ferhenga zimanekî din dibin. Ji vê alîyê ve kodguherîn ji deynkirinê cudatir e. Bêjeyên bicihkirî (embedded words) yên deyngirtî, nasnameya morfolojîk, sentaktîk û bi piranî jî ya morfolojîk a zimanê bingehîn digirin. Bêjeyên deyngirtî di axiftîna kesên yekzimanî yên zimanê bingehîn da jî dibe ku cih bigirin. Di kodguherînê da hêmanên hatine girtin nakevin bin bandora morfolojî, sentaks û fonolojîya zimanê bingehîn (Poplack, 2004, r. 590). Deynkirin ji ber ku bicihbûyî ye, ji ber xwe ve (spontane) nabe. Ligor îfadeya Poplack (2012) deynkirin ew e ku axiverê duzimanî, ji leksîkona xwe ya zîhnî ya bêjeyan; ji bo leksîkona xwe ya zîhnî ya zimanekî din, bêjeyan kopî dike. Poplack ferqa kodguherîn û deynkirinê dispêre vê yekê ku ka bêjeya ku hatîye kopîkirin bi tenê rasterast dikeve nav sentaksê yan na, an jî pêşîyê jî bo leksîkoneka zîhnî tê kopîkirin an na?

Di xebateka xwe da Dion û Poplack (2012, r. 279) tesbît dikin ku hêmanên zimanê donor ên bi serê xwe, ji serî da bi zimanê bingehîn ve hatine entegrekirin lê hêmanên pîrbêjeyî û linavhevketî morfosentaksa zimanê donor parastîye. Bi vê yekê xwe digihînin vê encamê ku rewşa yekem deynkirin e, ya duyan kodguherîn e.

Myers-Scotton (2010, r. 30,31) ferqa deynkirin û kodguherînê bi çend xalan dîyar dike û dibêje hêmanên ku bi piranî di nav axiftîna civakê da tîne dîtin wekî hêmanên deyngirtî tîne qebûlkirin, yên din wekî kodguherîn tîne qebûlkirin. Hêmanên tîne deynkirin dibin perçeyên leksîkona zîhnî ya zimanê bingehîn, hêmanên kodguhertî wekî hêmanên zimanê bicihkirî dimînin. Bêjeyên ku çandê transfer dikin, wekî hêmanên nû yên zimanê bingehîn an jî wekî hêmanên ji bo têgihan, wekî deyngirtî tîne pênasekirin. Ev hêman valahîyên zimên ên bêjeyî dadigirin. Bêjeyên transfera çandê yên deyngirtî, di zimanê bingehîn da jî bo têgih an jî heyberên nû tîne bikaranîn. Hêmanên tîne deynkirin ji hêla fonolojîk ve bi zimanê bingehîn

ve tên entegrekirin, hêmanên kodguherînê pir kêr caran rastî entegrasyona fonolojîk tên. Hem formên deynkirinê hem jî formên kodguherînê yê serbixwe (single codswitching form) entegreyî zimanê bingehîn dibin. Lê dîsa jî di navbera hêmanên deynkirinê û hêmanên kodguherînê da ferq heye. Bi piranî hêmanên deynkirinê zêdetir entegrasyonê nîşan didin.

Myers Scotton (1997, r. 169) Modela Çarçoveya Zimanê Bingehîn (Matrix Language Frame Model) bi pêş dixê û di çarçoveya vê modelê da têgihên zimanê bingehîn û zimanê bicihkirî pênase dike. Li gor vê modelê zimanê bingehîn ew ziman e ku di esnaya kodguherînê da çarçoveya morfosentaktîk dîyar dike, zimanê bicihkirî jî ew ziman e ku ji bo çarçoveya zimanê bingehîn bêjeyan an jî hêmanan temîn dike. Myers bi navê deynkirina çandî (cultural borrowing) û deynkirina esas (core borrowing) du cureyên deynkirinê dîyar dike. Deynkirina çandî, têgih û eşyayên nû yê navên wan di zimanê bingehîn da tune ne û ji zimanê bicihkirî hatine girtin, îfade dike; deynkirina esas jî bêjeyên ku di zimanê bingehîn da hene lê ji ber prestîj an jî sedemên civakî ketine nav zimanê bingehîn îfade dike. Deynkirina esas di serî da wekî formên kodguherînê dikevin nav zimanê bingehîn, bi domana demê ra vediguhêzine deynkirinê. Myers ji bo ferqa kodguherîn û deynkirinê van sê xalên sereke dîyar dike (Myers-Scotton, 1992):

1.Ferhenga Zihni (Mental Lexicon): Hêmana deynkirî daxilî ferhenga zihni ya zimanê bingehîn dibe. Axiver zimanê bicihkirî nizanibe jî hêmana aîdî zimanê bicihkirî dikare di nav axiftina zimanê bingehîn da bi kar bîne. Lê kodguherîn, tenê di esnaya axiftinê da pêk tê û hêmana hatî girtin hê jî aîdî zimanê bicihkirî ye.

2.Frekans û Bicîhbûn (Frequency and Listedness): Ferqa herî giring a navbera kodguherîn û deynkirinê frekans e. Bêjeyek çiqasî zêde di nav civakê da berbelav bêt bikaranîn û çiqasî di ferhenga wî zimanî da bi cih bibe ew bêje ewqas wekî hêmaneka deynkirî tê hesabandin.

3.Helwesta Morfosentaktîk: Myers ji bo ferqa navbera deynkirin û formên kodguherînê yê serbixwe entegrasyona morfosentaktîk wekî pîvanekê nabîne, lewra hem formên deynkirinê hem jî formên kodguherînê yê serbixwe dibe ku ji hêla rêbazên gramatîk ve entegrasyonê nîşan bidin.

Bi giştî dikare bê gotin ku ferqa di navbera kodguherîn û deynkirinê da di kontrasta entegrebûn û neentegrebûnê da tê nirxandin. Wekî din asta rêjeya bikaranîna nava gel, aîdîyeta nasnameya zimanê bingehîn, spontanebûn û nespontanebûn, aîdîyeta leksîkona zimanê bingehîn ji bo jihev cudakirina deynkirin û kodguherînê wekî çend xalên giring derdikevin pêş.

2. Mînakên Kodguherînê di kurdiya Îdirê da

Li ser erdnîgarîya Îdirê di dîrokê da gelek ziman hatine axiftin. Ji avabûna Komara Tirkîyeyê vir da, li Îdirê tirkîya Azerbaycanî û kurdiya kurmançî hatine axiftin, di gel vê jî ber ku zimanê fermî jî tirkîya standard bûye; tirkîya standard jî di sazî û dezgehên dewletê da, di perwerdeyê da û di çapameniyê da hatîye bikaranîn. Bivê nevwê jî ber ku zimanê fermî û desthilatdarîyê û yê perwerdeyê tirkî bûye; û ji ber politîkayên fermî yê zimên, li Îdirê gelek gotin û bêjeyên tirkî ji kurdiya xuyan ra bûne alternatîf û ketine nav axiftina kurmançî ya kurdan.

Gotinên devkî yê ku li qadê hatine berhev kirin, didin xuyakirin ku di axiftina kurdên Îdirê da hem kodguherîna navbera risteyan hem jî kodguherîna nav risteyê bi awayekî berbiçav pêk hatîye.

2.1. Kodguherîna Navberisteyî

Li gor daneyên qadê kodguherîna navberisteyî di axiftina hin kesan da gelek caran pêk hatîye, di axiftina hin kesan da hema hema qet nehatîye bikaranîn. Axiverên ku serî li kodên di nav sînorê hevokê da dane carinan bi awayên cuda cuda serî li kodên tirkî dane.

1.Îja bazirganek diçe tê here Helebê. Heleb neresî? Surye de mî?¹ He Surye. Ye here Helewê (Ş.N, 2025).

Di (1)'ê da axiver pêşiyê gotina xwe bi kurdî didomîne pişt ra derbasî tirkî dibe paşê dîsa derbasî kurdî dibe. Axiver li vir, bi armanca hînbûna agahîyekê û pesendkirina mijarê kod diguhere. Dibe ku ji ber fermîbûna zimanê tirkî û prestîja tirkî ya di serê axiver da, axiver dema agahîyeka erdnîgarîyî yan jî dîrokî

¹ Heleb ku der e? Suriye, ne wisa?

dide, berê xwe dide tirkî.

2. *Nawêjin. Kesî negotye. Çox êle şeyler vardi.² Bîra mi naynê* (Ş.N, 2025).

Di (2)'yê da axiver bi kurdî dipeyive pişt ra bi awayekî spontane bi gotina “Çox êle şeyler vardi.” risteyeka tirkî bi lêv dike. Dema axiver tecrûbeyên xwe yê berê tîne zimên serî li kodguherînê dide.

3. *Genctîya mi her şey Edetlîyê gişk... “Biz orda at qoştûrdûx.³” tirka negotî* (Ş.N, 2025).

4. *Ajote pêşya mi, ez sekinîm. “Nîye dûrmûyorsûn?”⁴ Mi go “Xêrdîr, sen kîmsin?”⁵ Go “Jandarma.” Yaw mi go “Jandarma bêle mi olur? Sîvîl, sîlahlî jandarma mi olur? Hanê tepe lambaniz? Hanê bî êleyiniz? Hanê belîrtînz?”⁶ Go “Yaw bîz balix tîmîyîz.”⁷ Mi go “Yaw balix tîmîysen benî qorxutmaya haqin yox kî.”⁸ Mi dî qijikî go “Vala amca sen de haqlisin.”⁹ Ewî go “Haqlisin.”¹⁰ Ez hinekî ser ve hatim. Mi hinekî tepkî zêde kir, go “Amca, bîz haqlisin dedîk, sen de artik şê yapma”¹¹ (Y.T, 2025).*

Di (3) û (4)'ê da axiver fonksiyona kodguherînê ya neqilkirinê bi kar tînin û risteyên tirkî dikin nav axiftina xwe, piştî wê dîyar dikin ku ev riste, risteyên neqilkirî ne.

5. *Pêşya wê me nasnedikir tabî. Benîm dediğim elli yıl, elli kaç..?¹² Wê şun ve mi Seyda nas kir. Pêncî salî pêşya niha mi Seyda nas kir* (Ş.N, 2025).

Di (5)'ê da axiver bi kurdî axiftina xwe didomîne pişt ra bi risteyeka tirkî axiftina xwe didomîne lê piştî wê risteyê dîsa axiftina xwe bi kurdî didomîne û risteya ku tirkî anîbû zimên vê carê bi gotineka kurdî temam dike. Axiver di nav sînorê zimanekî da xwe sînardar nake bi rehetî di navbera her du zimanan da tê û diçe, û hakimîyeta xwe ya li ser her du zimanan bi kar tîne.

6. *Mi sê roja bigota dehata da, mi kilamek tekrar nedikir caka tekrar nedigo. O qeder heves vardi. Ama şîmdî yox. Tek bîtane soylemîyorum.¹³ Me par biharê gote Kawisê Milanî... (Ş.N, 2025).*

Di (6)'ê da axiver bi kurdî didomîne pişt ra koda axiftinê diguhere û sê risteyan, bi tirkî tîne zimên û paşê dîsa derbasî kodên kurdî dibe.

7. *Axta pêçeye wî lëndixistin, kal pîra qûn ve ziqlamîş diwûn. Öyle güzel çalıyordu.¹⁴ Isa rind lëndixist. Herkes sanatçı olamîyor.¹⁵ Tu sed hespa bavêjî yarişê yek birinci derdikeve, bax (Ş.N, 2025).*

8. *Zaten aşaxi yûxari doksan bêşê wan da dest her tiştî vekişand. Her şeyden el çekti* (S.Ş, 2025).

Di (7)'ê da risteya tirkî “Öyle güzel çalıyordu.” dikeve nav axiftina axiver. Axiver peyama ku bi risteya tirkî anîbû zimên vê carê bi risteya kurdî “İsa rind lëndixist.” tîne zimên. Di (8)'ê da jî heman rewş derdikeve holê. Axiver ji bo ku peyamê baştir bide famkirin an jî bide pesendkirin û peyamê bi her du zimanan tîne zimên.

9. *Ye enazinde dere qereqolê naz bike, ye bizaniwe dilekçekî binvise, Aylesini savûnacax diyecek ‘Qomtan bû haqaret oldu, bû bêle oldû.’¹⁶ Sîrf sa wêya dişînin wellahî (Ş.N, 2025).*

10. *Tev wana çû Qersê lîse xund. Wê hingê lîsa vira hê tune wû. Lîsa Îdirê hê tune wû. Cevdet abê*

² Gelek tiştên wisa hebûn.

³ Ev biwêjek e. Di wateya “ Me li wir ciwantîya xwe derbas kir.” da tê bikaranîn.

⁴ Çima nasekinî?

⁵ Tu kê yî?

⁶ Cendîrme qey wiha dibin? Cendîrme sîvîl û bi çek dibin? Ka lembe ser ereba we? Ka êlegê we? Ka nişaneyê we?

⁷ Em tîma masîyan e.

⁸ Hûn tîma masîyan jî bin, heqê we yî hûn min bitirsînin heye?

⁹ Apo tu jî mafdar î.

¹⁰ Mafdar î.

¹¹ Apo, me go tu mafdar î, tu jî êdî ewk neke.

¹² Ya ku ez dibêjim pêncî sal, pêncî çend?

¹³ Ewqas hewasa min hebû. Lê niha tune ye. Yekê jî nabêjim.

¹⁴ Wisa rind lê dixist.

¹⁵ Herkes nikare bibe hunermend.

¹⁶ Wê malbata xwe biparêze. Wê bêje “Fermendar ev heqaret bû, ev tişt wiha bû.”

çox zekîydî. Doxuanadolu bølge bîrîncîsîydî. Hacetepeyî qazandî. Hacetepeyê qazandî, tipi (Ş.N, 2025).¹⁷

11. *Meytew me bêş xwind mi dîploma istand, yalniz dört kere dört qaç etîyîni bîlmîyordûm* (Y.T, 2025).

Di (9), (10) û (11)'ê da axiver axiftinê bi kurdî didomîne dema ku tê meseleya têkildarî argûmanên bi fermiyetê ve girêdayî, kodê diguherin û axiftinê bi tirkî didomînin. Di (4) û (9)'ê da dema axiftina kesên xwedî erkên fermî neqil dikin, neqlê bi zimanê wan kesan ango bi tirkî dikin.

12. *Qedir qîmetê wî her derê hate girtinê. Ne oldum dememelî, ne olacam demelî* (S.Ş, 2025).

Di (12)'ê da axiftin bi kurdî didome di dawiyê da axiver, fikra bingehîn a axiftina xwe bi îdyomeka bi tirkî tîne zimên.

13. *Go “Na wele ez nadim.” Go “Men veremenem.” Ecem û. Terekeme wû. Mi go “Abla pazarliximiz bîtî.” Go “Na, nadim.” Mi go “Lê çi dojî?” Go “Bîst dudu.” Mi go “Mêrê te gotye bîst yek.” Go “Na wele.” Mi kir wê kir, me bîst dudu istand* (Y.T, 2025).

Di (13)'ê da axiver ji keseka tirk risteyan neqil dike. Risteyan carinan bi zimanê wê neqil dike carinan tevî wergera wan a kurdî neqil dike. Bi gotina “*Men veremenem.*” nasnameya xwedîyê gotinê dide dîyarkirin. Dema gotina xwe bi kodên tirkî neqil dike bi tirkîya standard neqil dike lê dema gotina wê kesê neqil dike bi kodên tirkîya lokal a tirkên Îdirê neqil dike. Pişt ra, bi gotina “*Ecem û, Terekeme wû.*” peyama ku bi risteya tirkîya lokal dabû, pesend dike.

2.2. Kodguherîna Navristeyî

2.2.1. Hejmar û Bilêvkirina Salan

Di kurmançiya Îdirê da dema hejmar wekî navên salan tîne bikaranîn bi piranî bi tirkî tîne bilêvkin, wekî din hejmar bi kurmançî tîne bilêvkin. Di (1) û (2)'yê da ji ber ku qesta axiveran sal in, hejmarên *ellî üç, bîn doquzyûz, on dord* bi tirkî bi lêv kirine. Di (3)'yê da axiver dîrokek; tevî roj, heyy û salê bi tirkî anîye zimên. Lê di (6), (9) û (10)'ê da qest ne sal in hejmarên *pêncî heft, pêncî û hefsid pêncî* bi kurdî bi lêv kirine. Hejmarên rêzkinê ji hêla heman kesî ve di (4)'ê da wekî *bîrîncî û îkîncî* bi tirkî, di (5)'ê da wekî *duda û sisya* bi kurmançî hatine bi lêv kirin. Di (6), (7) û (8)'ê da dîsa hejmarên rêzkinê bi tirkî hatine zimên.

1. *Ellî üç doxumlî* me (S.Ş, 2025).

[jidayîkbûn pêncî û sê] K1.YJ¹⁸

2. *Evana zate Edetlî, berê hê bîn doquzyûz... pêşya on dordê...* (Ş.N, 2025).

[hezar û nehsed]

[çardeh] OBL.YJ.M¹⁹

3. *Yêrmî alti/ sifir yêdi/ bîn doquz yuz atmiş doquz* (Y.T, 2025).

[Bîst û şeş/ sifir heft/ hezar û neh sed û şeş û neh]

4. *Yanê gund da em caka bîrîncî nin we, îkîncî siray da wûn, yale pêz- hewîn ve* (Ş.N, 2025).

¹⁷ Kekê Cevdet pir jîr bû. Yekemînê herêma Rohhilatê Anatolîyayê bû. Hacetepe qezenc kir. Li Hacetepeyê Beşa bijîşkîyê qezenc kir.

¹⁸ K1: Kesê Yekem, YJ: Yekjimar

¹⁹ OBL: Oblîk, M: Zayenda mê

[yekem] [rêza duyem]

5. *Go a wele mala **duda** mala **sisya** serî da – mal a rex hev in* (Ş.N, 2025).

[duyem] [sêyem]

6. *Yêdincî ayê da ketme **pêncî hefta*** (Y.T, 2025).

[Di meha heftem da]

7. *Bîrîncî sinifê da terk kir* (S.Ş, 2025).

[pola yekem]

8. *Elhemdla **îlk traktor** gund da wîya stand* (S.Ş, 2025).

[traktora ewil]

9. *Yanê **gence yaşe** mi da wê **bölgê** da eger'k **pêncî hew** ye **yaşe** mi da hewya* (Ş.N, 2025).

[ciwan] [temen] OBL.K1.YJ [herêm]

10. *Hesa bike bitûn erde wî gundî tapilî **hefsid pêncî** dönim û* (Ş.N, 2025).

2.2.2. Ravek û Firaz

Di (1)'ê da firaza tirkî *Iğdir doxumlî* di nav forma sentaksa kurmançî da hatîye bikaranîn. Di kurmançî da navê bajêr Îdir e û di nav axiftina axiver da jî bi piranî navê Îdir hatîye bikaranîn. Lê di firaza *Iğdir doxumlî* da ji ber ku firaz transferî nav sentaksa kurmançî bûye navê bajêr jî bi tirkî hatîye bilêvkerin. Di (2)'yê da raveka *madî duruma xu* da *madî durum* ravekeka tirkî ye û li gor rêbazên avabûna raveka tirkî ava bûye. Dema ku bi cihna *xu* ra raveka zincîrî çê bûye rêbazên raveka kurmançî ketîye dewrê. Di (4),(5) û (7)'ê da jî heman rewş pêk hatîye ku *ses têlî*, *hayvan ticaretî* û *Nuhnebî Camîsî* ravekên tirkî ne û li gor rêbazên avabûna raveka tirkî ava bûne. Di (4)'ê da dema ku bi cihna *mi* ra, di (5)'ê da bi bêjeya tirkî *îş'*ê ra, di (7)'ê da bi bêjeya tirkî *yer'*ê ra raveka zincîrî çê bûye dîsa rêbazên raveka kurmançî ketîye dewrê. Di (3)'yê da raveka tirkî *îkîncî sira* ketîye nav risteya kurmançî lê raveker gireya tewangê ya kurmançî girtîye û entegrasyonê ji bo rêbaza avabûna raveka kurmançî nişan daye. Di (6)'ê da raveka *kalp yetmezlîxî* bi temamî li gor rêbazên avabûna raveka tirkî ava bûye û nav risteyeka kurdî da hatîye bikaranîn. Lê herçiqas ravekên *madî durum*, *ses têlî*, *kalp yetmezlîxî* li gor rêbazên raveka tirkî ava bûbûn jî di kurdîya Îdirîyan da li hember van ravekan gotineka alternatîf a kurdî tune ye.

1. *Iğdir doxumlî me* (Ş.N, 2025).

[Jidayikbûyê Îdirê] K1.YJ

2. Gorey *derdora xu*, gorey *madî duruma xu* (Ş.N, 2025).

[rewşa aborî] ÎZ²⁰.M

3. Yanê *gund da em caka bîrîncî nîn we, îkîncî sira-y²¹ da wûn, yale pêz- hewîn va* (Ş.N, 2025)

[yekem] [rêza duyem]

4. Yanî *ses tel²²-y-e²³ mi xera bûn* (Ş.N, 2025).

[têla dengê] -DK²⁴-ÎZ. PJ

5. Tabî *me arekî îşê kay kir, îşê hayvan fîcareftîyê kir* (Y.T, 2025).

[karê bazirganîya ajelan]

6. *Kalp yetmezîxî hewû* (S.Ş, 2025).

[têrnekirina dilî]

7. *Yêra Nuhnebî camîsyê ya me wû* (S.Ş, 2025).

[Cihê Mizgefta Nuh Nebî]

2.2.3. Bêje

Di (1)'ê da bêjeya kurmançî *mal* û wateya wê ya tirkî *gîl* bi hev ra hatine bikaranîn. Di vê risteyê da axiver, ewil bêjeya kurmançî *mal*'ê bi kar tîne û pişt ra bi awayekî spontane bêjeya tirkî ya hemwateya *mal*'ê, *gîl*'ê bi kar tîne. Bikaranîneka bi heman awayî di (4)'ê da jî xuya dike. Bêjeya tirkî *toplantî* û hemwateya wê ya kurmançî *civak*²⁵'ê bi hev ra bi kar tîne. Di (5)'ê da jî bêjeya tirkî *her şey* û hemwateya wê ya KÎ (kurmançiya Îdirê) *gişk*, bêjeya KÎ *îro* ya di (6a) û (6b)'yê da bêjeya tirkî *günümüz* di heman axiftinê da bi heman awayî hatine bikaranîn. Di (2a)'yê da bêjeya tirkî *yaş* hatîye bikaranîn lê axiver di heman axiftina xwe da bêjeya *emir*²⁶, a ku aîdê leksikona KÎ ye jî bi kar tîne. Ev rewş ji bo bêjeya tirkî *bitûn* a di (3a)'yê da û bêjeya kurmançî *hemû* ya di (3b)'yê da bi heman awayî pêk hatîye.

Di (2a)'yê da bêjeya tirkî *bölge*, di (3a)'yê da bêjeya *dönim*, di (7)'ê da bêjeya *örencî* di (8)'ê da bêjeya *dönek*'ê di her çar bêjeyan da jî dengê [œ], yê aîdê tirkî (Sebzecioglu, 2017, s. 71), entegrasyoneka

²⁰ ÎZ: Îzafe

²¹ Di KÎ' da pirtika zayenda mê ya rewşa oblik *ê*, dema tê bêjeyeka bi dengdêrê qedayî, dengê kelijandinê [j] ku di alfabeya latînî a kurdî da bi tîpa /y/'yê tê simbolîzekirin, dikeve navbera pirtik û bêjeyê. Di axiftinê da pirtika *ê*'yê tê xwarin û /y/ tenê dimîne.

²² Raveka *ses telî* ravekeka tirkî ye ku li gor rêbaza avabûna raveka tirkî ava bûye. Ravek ji bêjeyên *ses* û *tel* pêk hatîye û bêjeya *tel* gireya raveka tirkî girtîye.

²³ Di kurmançiya standard da gireya îzafeyê ya pirjimariyê *-ên* e. Lê di kurmançiya Îdirê da bi piranî dengê [n]'yê nayê bilêvkirin tenê dengê [e]'yê tê bilêvkirin. Hinek eşîr jî dengê [e]'yê wekî [e]'yê bi lêv dikin ku ev deng di alfabeya kurdî da dengê [e] bi tîpa /ê/'yê, dengê [e] bi tîpa /e/'yê tê simbolîzekirin.

²⁴ DK: Dengê Kelandinê

²⁵ Axiver, bêjeya *civak*'ê di wateya *civîn*'ê da bi kar tîne.

²⁶ Dengêkî farîngeal û frîkatîv e. Nêzî dengê tîpa erebî *ع*'ê ye.

fonolojik nişan nedaye, dengê [œ]’yê (Sebzecioğlu, 2017, s. 71), dema bêje di risteya kurmancî da hatine bikaranîn hatîye parastin. Lê bêjeya *bölge*’yê, li gor rêbazên raveka kurmancî form girtîye ango tewîyaye. Herçiqas hin ji van bêjeyan ji hêla morfolojîk ve entegrasyon nişan dabe, hinekan nişan nedabe jî îro di kurmancîya Îdirê da, bêjeyên cihê van bêjeyan bigirin tune ne. Tenê dewsa bêjeya *dönim*’ê da bêjeya *dağar* tê bikaranîn. Ji xeynî bêjeya *dönim*’ê bêjeyên *bölge*, *örencî*, *dönek* ne mînakên kodguherînê ne. Tenê mirov dikare bêjeya *dönim*’ê di çarçoveya kodguherînê da binirxîne. Di (6a)’yê da jî bêjeya *günümüzde* hem ji hêla fonetîk hem jî ji hêla morfolojîk ve tu entegrasyon nişan nedaye û rasterast dewsa kodeka sentaksa kurmancî girtîye ku ev jî mînakeka kodguherînê ye.

1. *Piştî wêya gund da mala Hecî Mihemedê Ûso, Başsînegê, Feqî Mîro gîller* (Ş.N, 2025).

[mal/wan]

2.

a. *Yanê gence yaş-e mi da wê bölg-ê²⁷ da eger’k pêncî hew ye yaş-e mi da hewya...* (Ş.N, 2025).

[ciwan temen]-ÎZ.N [herêm]-OBL.YJ

b. *Na, kullî sala emre me zozana çûye* (Ş.N, 2025).

3.

a. *Hesa bike bitûn erde wî gundî tapîlî hefsîd pêncî dönîm û* (Ş.N, 2025).

[hemû]

b. *Hemû’l vê derê ne* (Ş.N, 2025).

4. *Kê derê toplantî, civak çêbûn, te wê derê xêra bave te we, şerbetekî bela ke.* (Ş.N, 2025).

[civîn]

5. *Gencîya mi herşey Edetlîyê, gişk...* (Ş.N, 2025).

[gişt]

6.

a. *Mesela evya niha nawêjin, günümüzde* (Ş.N, 2025).

[di roja îro da]

²⁷ Forma bêjeyê ya orijînal *bölge* ye. Lê li vir bêje li gor rewşa oblîk a kurmancîya îdirê teşe girtîye.

b. *Evan kilame me berê bihîstûn, mesela îro da nê gotinê kîjan in* (Ş.N, 2025)?

7. *Zivistanê òretmen dihatin, are are diman* (Y.T, 2025).

[mamoste]

8. *Muxtar gere virek we, muxtar dōnek we* (Ş.N, 2025).

[durû]

2.3.4. Gihanek

Di (1a)'yê da gihaneka tirkî *ema*²⁸ û di (1b)'yê da gihaneka kurdî *lê* di heman wateyê da ne û ji aliyê heman kesî ve di du risteyên cuda da hatine bikaranîn. Li vir dikare bê gotin ku gihaneka *ema* ne aîdê leksîkona kurmançiya Îdirê ye. Dema gihaneka tirkî *ema*, di risteya kurdî da hatîye bikaranîn tenê ji hêla fonetîkê ve entegrasyon nîşan daye. Di (2)'yê da jî heman rewş xuya ye. Di (2a)'yê da gihaneka tirkî *dahî* û di (2b)'yê da gihaneka kurmançî jî di heman wateyê da ne û ji hêla heman kesî ve di du risteyên cuda da hatine bikaranîn. Gihaneka tirkî *dahî* dema di risteya kurmançî da hatîye bikaranîn entegrasyoneka fonolojîk an jî morfolojîk nîşan nedaye.

1.

a. *Ez tiştê zû bîr dikim ema tiştê wê axê bîr nawin* (Y.T, 2025).

[lê]

b. *Hetî sihet hefta heyştê em dixewitîn, lê akî dinê na* (Y.T, 2025).

2.

a. *Ro'k we jî kîlo şîr dahî bigrin bira bigrin* (N.T, 2025).

[jî]

b. *Daha pezekî gümrah î bê beran jî tine* (N.T, 2025).

2.2.5. Cotepeyv

Di (1)'ê da cotepeyva tirkî *îster îstemez* bêyî ku entegrasyoneka fonolojîk û morfolojîk nîşan bide di risteyeka kurmançî da hatîye bikaranîn.

1. *Îster îstemez pez ê têkeve kûyê*²⁹ (N.T, 2025).

[Bivê nevê]

Encam

Ev xebata ku li ser kurdîya Îdirê hatîye kirin, dîyar dike ka li Îdirê encama temasa kurdî û tirkî çawa li ser kodguherînê bandor kirîye. Di vê xebatê da hatîye dîtin ku ji ber cîrantîya bi tirkan ra, zimanê perwerdeyê, li bajêr di navbera tirk û kurdan da bikaranîna tirkî ya wekî *lingua franca*, medya, internet û

²⁸ Herçiqas ev gihanek bi eslê xwe bi erebî be jî (<https://sozluk.gov.tr/>) bi rêya tirkî ketîye nav kurdîya Îdirê.

²⁹ Di nav daneyên li ber dest da tenê mînakeka cotepeyvê hebû, ji ber wê tenê mînakek hatîye dayîn.

polîtîkayên fermî yên zimên di nav kurdên Îdirê da duzimanî berbelav e û li ser axiftina wan a kurdî jî bandora tirkî xwe nîşan daye. Herweha hatîye tesbîtkirin ku di nav axiftina kurdî ya kurdên Îdirê da gelek caran kodên tirkî tîn bikaranîn. Daneyên zimanî yên ji Îdirê hatine berhevkerin, bi awayekî zelal nîşan didin ku kodguherîna di nav axiftina kurdîya Îdirê da dîyardeyeka berbelav e. Ev dîyarde bi awayekî berbiçav hem navberristeyî hem jî navristeyî pêk tê, û her du cure jî li gor rewşa zimanî ya axiveran, di axiftina axiveran da cih digirin. Kodguherîna navberristeyî, di nav sînorên axiftinê da pêk tê ku di kurdîya Îdirê da pêkhatina wê li gor kesan diguhere. Di axiftina hin kesan da hema hema qet pêk nayê lê di axiftina hin kesan da gelek mînakên wê xuya dikin

Bi vê xebatê hat dîtin ku axiveran tenê di asta bêjeyî da jî tirkî kod negirtine, di heman demê da wekî stratejîyeka ragihandinê hem di asta navberristeyî hem jî di asta navristeyî da serî li kodguherînê dane. Axiveran kodguherîna navberristeyî di neqilkirina gotinên fermî da, yan jî di peywenda meseleyên fermî da bi kar anîne. Di gel vê, axiveran dema xwastine zêdetir balê bikişînine ser mijarê, qabilîyeta xwe ya retorîk nîşan bidin û dema ku xwastine nasnameya kesê gotina wî neqil dikin bi taybetî dîyar bikin; kodên tirkî transferî nav axiftina xwe kirine. Transfera kodên tirkî, axiver jî kontekstê dîr nexistine, axiver herçiqas kodên zimanekî din xistibin nav axiftina xwe jî, konteksta xwe xerab nekirîye û herikbarîya axiftina xwe domandîye.

Di kurdîya Îdirê da cureyê kodguherînê yê herî zêde pêk tê kodguherîna navristeyî ye. Wekî ku berê jî hatibû bilêvkirin, di nava risteyê da kodguherîn di nav sînorên bêje û firazê da pêk tê. Firaz, ravek, cureyên bêjeyên watedar (content words) û yên fonksîyonel; jî tirkî transferî nav kurdîya Îdirê dibin û wekî kodeka tirkî di nav risteyê kurdî da cih digirin.

Di kurdîya Îdirê da di nav sînorên bêjeyê da dema navên salan tîn bilêvkirin, bi tirkî tîn bilêvkirin lê wekî din hejmar bi piranî bi kurdî tîn bilêvkirin. Dema bi taybetî daxwaza bi kurdî bilêvkirina salan jî axiverekî bê kirin, kurdîya salan jî dikarin bi lêv bikin lê di nav axiftina xwe da bi tirkî bi lêv dikin. Herçiqas carinan hejmarên rêzkerinê bi tirkî bîn bilêvkirin jî gelek caran heman kes jî kurdîya wan jî haydar in û carinan bi tirkî carinan jî bi kurmancî bi lêv dikin. Herweha bêjeyên wekî navdêr, rengdêr û hoker; gihanek jî bi heman awayî hem tirkî hem jî kurdîya wan di nav heman axiftinê da hatîye bikaranîn ku di nav sînorê kodguherînê da tê nirxandin. Di ravekan da herçiqas hin ravek bêyî entegrasyoneka morfolojîk ketibin nav kurdîya Îdirê jî ji ber ku gotineka ku cihê wan di kurdîya Îdirê da tê bikaranîn tune ye ew jî di wekî formeka kodguherînê nayê nirxandin.

Di çarçoveya vê xebatê da dikare bê gotin ku hejmara kodên tirkî, di nav axiftina kurdî ya hin kurdên Îdirê da pir e. Di nav axiftina wan da kodên tirkî bi piranî di asta navristeyî da cih digirin lê gelek caran jî di asta navberristeyî da cih digirin. Ev yek li gor temasa axiver ya bi tirkî ra diguhere. Axiveran li gor konteksta axiftina xwe û li gor hewcedariya xwe kodên tirkî xistine nav axiftina xwe. Bi zêdebûna xebatên qadê, kodguherîna nav axiftina kurdî ya kurdên Îdirê dikare ji gelek hêlên din ve jî bê vekolan. Eger rêjeya daneyên ji qadê zêde bibe, hem dê asta kodguherînê ya nav kurdîya Îdirê zêdetir zelal bibe hem jî dê sedemên kodguherînê zêdetir derkevin holê û analîzên baştir bîn kirin.

Çavkanî

- Appel, R., & Muysken, P. (2005). *Language contact and bilingualism*. Amsterdam University Press.
- Auer, P. (2021). Language contact. E. Adamou & Y. Matras içinde, *The Routledge handbook of language contact* (s. 147-167). Routledge.
- Balli, S. Ç. (2019). A note on the contact between Kurmanji Kurdish and Turkish at lexical and morphological level. *International Journal Of Bilingualism*, 23(4), 861-864.
- Berg, B. L. (2001). *Qualitative research method for the social science*. Allyn & Bacon.
- Bucholtz, M., & Zimman, L. (2019). Language in the social world. C. Genetti içinde, *How languages work an introduction to language and linguistics* (s. 164-194). Cambridge University Press.
- Creswel, J. W. (2003). *Research design: Qualitative, quantitative, and mixed methods approaches*. Sage Publications.
- Crystal, D. (2001). *Language and the internet*. Cambridge University Press.
- Crystal, D. (2003). *English as a global language*. Cambridge Press.
- Delikaya, Ö. (2016). *Peyvsazî di kurmançî de: Nêrîneke giştî*. (Teza Lisansa Bilind a Çapnekirî). Zanîngeha Bingöl.
- Ertekin, M. Z., & Açar, Z. (2019). Guherîna ziman û tesîra wê li ser axaftina rojane di pêbenda kontakta zimanan de - herêma Wanê. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 5(10), 31-46.
- Gumperz, J. J. (1982). *Discourse strategies*. Cambridge University Press.
- Haig, G. (2007). Grammatical borrowing in kurdish (northern group). Y. Matras, & J. Sakel içinde, *Grammatical borrowing in cross-linguistic perspective* (s. 165-184). Walter de Gruyter GmbH & Co. KG.
- Herkenrath, A. (2016). Codeswitching as a window to Turkish-(Kurmanji-German) multilingualism. *Workshop über Code-Switching und Code-Mixing*. Dortmund.
- Herkenrath, A. (2020). Codeswitching in metalinguistic reflection: The first generation of (Kurmanji-Turkish-German speakers). *Colloquium 'Turcological linguistics in Berlin and around'*. Berlin.
- Holmes, J. (2013). *An introduction to sociolinguistics*. Routledge.
- Kim, E. (2006). Reasons and motivations for code-mixing and codeswitching. *Issues in EFL*, 43-61.
- Malik, L. (1994). *Socio-linguistics: a study of code-switching*. Anmol.
- Martin-Jones, M., Blackledge, A., & Creese, A. (2012). *The Routledge handbook of multilingualism*. Routledge.
- Matros, Y. (2009). *Language contact*. Cambridge University Press.
- Milroy, L., & Muysken, P. (1995). *One speaker, two languages*. Cambridge University Press.
- Muysken, P. (1995). Code-switching and grammatical theory. L. Milroy, & P. Muysken içinde, *One speaker, two languages: cross-disciplinary perspectives on code-switching* (s. 177-198). Cambridge University Press.
- Muysken, P. (2012). Code-switching. *The Cambridge handbook of sociolinguistics*. 301-314.
- Myers-Scotton, C. (1992). Comparing codeswitching and borrowing. *Journal of Multilingual & Multicultural Development*. (13), 19-39.
- Myers-Scotton, C. (1993). *Duelling languages: grammatical structure in codeswitching*. Oxford: Clarendon Press.
- Myers-Scotton, C. (1993). *Social motivations for codeswitching*. Oxford University Press.
- Myers-Scotton, C. (1997). *duelling languages: grammatical structure in codeswitching*. Clarendon Press.
- Poplack, S. (1980). Sometimes I'll start a sentence in Spanish y termino en Espanoi: toward a typology of code-switching. *Linguistics*. r. 583-618.
- Poplack, S. (1988). Code-switching. U. Ammon, N. Dittmar, & K. J. Mattheier içinde, *Sociolinguistics: An international handbook of the science of language and society* (s. 1174-1180). Berkeley: Walter de Gruyter.
- Poplack, S. (2001). Code switching: Linguistic. N. J. Smelser, & P. B. Baltes içinde, *International encyclopedia of the social & behavioral sciences* (s. 2062-2065). Else vier.
- Poplack, S. (2004). Code switching. U. Ammon, N. Dittmar, K. J. Mattheier, & P. Trudgill içinde, *Sociolinguistics/Soziolinguistik: An international handbook of the science* (s. 589-596). Berlin: Walter de Gruyter.

- Poplack, S. (2018). *Loanwords in the speech community and in the grammar*. Oxford University Press.
- Poplack, S., & Dion, N. (2012). Myths and facts about loanword development. *Language Variation and Change*. 279–315.
- Rasdi, N. I. (2016). *Intrasentential code-switching among malays in malaysia on facebook*. Nonpress Doctoral Dissertation.
- Sebzecioğlu, T. (2017). *Dilbilim kavramlarıyla türkçe dilbilgisi*. Kesit.
- Sodah, N. (2019). The impact of social status on language shift: a case study on family domain language in Lembar. *International Journal of Multicultural and Multireligious Understanding*. s. 959-967.
- Subaşı, K. (2020). Tesîra zimanê tirkî li ser devoka serhedê: wekî nimûne Milazgirta Mûşê. *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 61-70.
- Thomason, S. G. (2001). *Language contact*. Edinburgh University Press.
- Thomason, S. G., & Kaufman, T. (1988). *Language contact, creolization, and genetic linguistics*. University of California Press.
- Treffers-Daller, J. (2025). The simple view of borrowing and code-switching. *International Journal of Bilingualism*, 347-370.
- Varol, O. (2021). Kurmanci-Türkçe ikidilliliğin temel koddâ deđişime açık ve sınırlı alanları. *Kurdîname*. 162-175.
- Wardhaugh, R. (2010). *An introduction to sociolinguistics*. Blackwell Publishing.
- Wardhaugh, R., & Fuller, J. (2015). *An introduction to sociolinguistics*. Blackwell Publishing.
- Winford, D. (2003). *An introduction to contact linguistics*. Blackwell Publishing.
- Yılmaz, G. K. (2014). İlya Topoyev'in öykülerinde Hakasça-Rusça kod deđiştirme. *Modern Türklük Araştırmaları Dergisi*. 208-234.
- Yonat, M. (2023). Türkçenin yerel bir varyasyonu olarak Kürtçe Türkçe iki dillilerin Türkçesi: Bazı temel fonolojik özelliklerin analizi. *The Journal of Mesopotamian Studies*. s. 47-62.
- Zebari, I. A. (2014). Conversational code-switching between Arabic and Kurdish in Duhok city. *International Journal of Science and Research (IJSR)*. 3(9).

Çavkanîyên Zindî

- N.T. (2025, 04, 20). Hevpeyvîn4. (Y. Taştan, Röportaj Yapan)
- S.Ş. (2025, 08, 30). Hevpeyvîn3. (Y. Taştan, Röportaj Yapan)
- Ş.N. (2025, 04, 24). Hevpeyvîn1. (Y. Taştan, Röportaj Yapan)
- Y.T. (2025, 08, 29). Hevpeyvîn2. (Y. Taştan, Röportaj Yapan)